Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (240) | Adar / 1-3-2023

# Çalakiyên Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî li Efrînê berdewam in




Piştî erdheja 6ê sibatê ku ziyaneke mezin gihande Nahiya Cindirêsa Efrînê li Kurdistana Sûriyê, û di encama vê erdhejê de zêdetirî hezar kesan jiyana xwe jidestdan, û bi sedan kes birîndar bûn, herwiha hejmareke zêde ya avahiyan rûxiyan.Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî bi awayekî lezgîn bi hewara xelkê Cindirêsê ve çû, û alîkarî li ser ziyandîtiyan belav kir. Heta niha jî Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî di kar û çalakiyên xwe de berdewam e û rojane alîkariyan bi ser gundekî Efrînê belav dike. Serokê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî Mûsa Ehmed ragihand, ofîsa wan li Efrînê heye, û heta ew bikaribin dê di alîkarîkirina xelkê Efrînê de berdewam bin.Heta niha 5 karwanên alîkariyan yê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî gihiştine Efrînê û bi berdewamî li ser xelkê tê belav kirin. Herwiha xelkê Efrînê jî dibêjin, bi hatina Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî hêvî bi wan hatiye bexşîn.

# 44 sal bi ser koça dawî ya Barzaniyê nemir re derbas dibin

Kurdistan

Mela Mistefa Barzanî kurê Şêx Mihemed kurê Şêx Ebdulselam Barzanî roja 14ê Adara 1903an li devera Barzan ji dayik bû ku tevahiya jiyana xwe ji bo şoreş û xebata ji bo bidestxistina mafên gelê Kurd terxan kiribû. General Mela Mistefa Barzanî, rêberê mezintirîn şoreş di dîroka rizgarxwaziya gelê Kurdistanê de ye, di dirêjahiya temenê xwe de wî dest ji daxwazkirina mafên xelkê bernedaye, hewl ji bo bidestanîna daxwazên wî yên neteweyî daye û rêbazeke tijî daxwaziyên neteweyî û niştîmanî li pey xwe hiştiye û bûye serkirde û nimûneyeke bilind a rastgoyî û daxwaz û mafên neteweyî.Mela Mistefa Barzanî, di qonaxeke dîrokî û çarenivîsdar de, têkoşîna li dijî dagirkerên hêzdar û bi piştevan hilbijart ku gelê kurd di serdemeke tijî êş û azar de dijiya ku ji bilî xwedê û rewayetiya doza û amadehiya zarokên gelê kurd ji bo azadiyê, ti piştevanî penayeke din jê re nebû. Lê belê bi vîneke bihêz, bi xwebawerî, rewabûna doza xwe û bi wêrekî şer ji bo miletê xwe kir û mîrateyeke mezin a têkoşînê li dijî zilm û zordariyê ji gelê kurd re hişt.

**Beşek ji westgehên jiyana Mela Mustefa Barzanî:**

Mela Mustefa Barzanî kurê Şêx Mihemed Barzanî ye û li gundê Barzan di 14ê Adara sala 1903an jidayik bû. Di temenê 3 saliyê de ji aliyê Osmaniyan ve ji piştî şikestina Şoreşa Barzanî Şêx Ebdulselam birayê mezin ê Mela Mustefa Barzanî hat girtin û Mustefa Barzanî û diya xwe ve li Mûslê hatin zîndanîkirin.

Heyama 6 salan ji aliyê çend mamosteyan ve li gundê Barzan mijûlî xwendinê bû û piştre Fiqhê Îslamê xwend û çar salan zanistên olî xwend û piştre jî li Silêmaniyê hewla temamkirina xwendinê da. Mela Mustefa Barzanî di sala 1919an de beşdarî di tevgera Şêx Mehmûd Hefîd li Silêmaniyê ku û serperiştiya tîmeke çekdarî ya 300 çekdaran kir. Di sala 1920an de biryarê wî yê mezin Şêx Ehmed Barzanî wî Mela Mustefa Barzanî wek nûner dişîne Bakurê Kurdistanê ji bo serdana Şêx Seîdê Pîran bike û hevahengiyê bi şoreşê re dirust bike. Di navbera salên 1931 – 1932an serperiştiya hêzeke Barzaniyan dike ji bo berevanîkirina li mihwerê Mêrgesor – Şêrwan li hember hêzên Îngilîzî û di wî şerî de ji ber jîrekî û karzaniya xwe bi navûdeng dibe û dikare wî mihwerî biparêze. Di sala 1934an de bi Şêx Ehemd Barzanî û hin ji piyayên wî diçin Tirkiyê ji bo daxwaza mafê penabertiyê bikin û piştre vedigerin Iraqê û ji aliyê Îngilîziyan û desthilata Iraqê ya wê demê bo başûrê Iraqê tên dûrxistin û piştî 10 salan vedigere Silêmaniyê. Di 12ê Tîrmeha 1943an de bi hevkariya rêxistina Hîwa li Silêmaniyê karî derbasî Rojhilatê Kurdistanê bibe. Di heman salê de ji Îranê vedigere navçeya Barzan û hejmarek xort li dor xwe kom dike û du mehan 2 hezar çekdarên xwebexş amade dike û dikarin dest danin binkeyeke polîs li navçê. Di Payîza



1943an de hikûmeta Bexdayê şandekê dişîne Barzan ji bo şer bê rawestandin û Mustefa Barzanî mercê vegera tevahiya kesên sirgûnkirî û ŞêX Ehemd dike û hikûmeta Nûrî Seîd hemû mercên Mustefa Barzanî bicih tîne. Di sala 1943 – 1945an de Şoreşa Barzan li dijî hikûmeta Iraqê ku hikûmeta Brîtaniya piştevaniyê lê dike serî hildide careke din şoreş li navçeyeke fereh a Kurdistanê belav dibe. Di 22ê Çileya 1946an de beşdarî di merasîma ragihandina Komara Kurdistan li Mehabadê de kir û ji aliyê Serokomarê Kurdistanê Qazî Mihemed ve Barzanî dibe Fermandarê Artêşa Komara Kurdistan û pileya General pê tê bexşandin. 16ê Tebaxa 1946an Barzanî Partiya Demokrat a Kurdistanê damezirand û wek serokê partiyê hat hilbijartin û li tevahiya kongreyên partiyê de tevî di hinan de amade nebû jî wek serokê partî hat hilbijartin.

Piştî şikestina Komara Kurdistanê, di sala 1947an de rêwîtiya dîrokî ber bi Sovyetê ve encam da û Barzanî amade nebû xwe radestî desthilatên Şahinşahê Îranê bike û ew ligel 500 çekdar ber bi Sovyet çûn û rûbirûyî artêşên Iraq, Îran û Tirkiyê bû. Roja 17ê Hezîrana 1947an Barzanî û hevalên xwe çemê Aras derbas kirinû gihîştin Sovyetê. Li Yekîtiya Sovyet ku Stalîn serokê wê bû, serederiya tund bi Barzanî û hevalên wî re hate kirin û piştî mirina Stalîn di sala 1953an de rewşa jiyana wan hinekî baş bû. Li Rûsya tevî derbaskirina temenê 45 saliyê, li Akademiya Zimanan li Moskoyê destpê kir û aborî, goegrafa, zanist û zimanê Rûsî xwend. Piştî şoreşa 14ê Tîrmeha 1958an, Barzanî û hevalên xwe vedigerin Iraqê û ji Besra û ta Hewlêrê camewer pêşwaziyê lê dikin. Serokomarê Iraqê Ebdilkerîm Qasim di 7ê Cotmeha 1958an pêşwazî li Barzanî û hevalên wî dike. Ji 11ê Îlona 1961 û ta 1975an Barzanî rêbertiya mezintirîn şoreşa çekdarî li dijî desthilatên Bexdayê kir û şoreşê 15 salan berdewam kir û tê de çendîn destkeftên netewî û niştimanî ji gelê Kurdistanê re bidest hat. Di 11ê Adara 1970î Barzanî û hikûmeta Iraqê li ser porjeya atonomî ji Kurdistanê re lihev dikin û bo cara yekem di dîroka Kurdistanê de şoreşeke Kurdî bi 9 salên xebatê dikare wê destkeftê ji Kurd re bidest bixe. Di 6ê Adara 1975an bi sedema rêkeftina Sedam Husên û Şahê Îranê Mihemed Reza li Cezaîrê, şoreşa Îlonê rastî şikandinê tê û ji ber wê Barzanî û bi hezaran Pêşmergeyên şoreşê riya koçberiyê hilbijart. Piştî şikestina 1975an careke din Barzanî çavdêrî û serperiştiya danîna kevirê bingehê yê şoreşê kir.

Di 1ê Adara 1979an Mela Mustefa Barzanî li Amerîka ji ber nexweşiyê koça dawiyê kir û di 5ê Gulana 1979an li ser wesiyeta wî li bajarê Şino yê Rojhilatê Kurdistanê li ser sînorê Başûr û Rojhilatê Kurdistanê bi xaka pîroz a Kurdistanê hat spartin. Piştî Raperîna Adara 1991an, termê Mela Mustefa Barzanî û Îdrîs Barzanî li aramiya xwe ji Rojhilatê Kurdistanê bo Herêma Kurdistanê cihê jidayikbûna xwe hat veguhastin û li navçeya Barzanî bi xakê hatin spartin.

Di heyama jiyana xwe de du caran Mela Mustefa Barzanî rastî hewlên terorkirinê hat û mocîze hat rizgarkirin, yek di 29ê Îlona 1971an û ya duyem jî di 16ê Tîrmeha 1972an de bû, lê her du caran ji bo berjewendiya gelê Kurdistanê, parastina aştî û aramiyê Kurdistanê dirustnebûna şer, rêkeftina Adara 1970î ya bi Bexdayê re hilneweşand.

# 11emîn salvegera şehîdkirina Nesredîn Birhik



11emîn salvegera şehîdkirina Nesredîn Birhik yek ji Serkirdeyên Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-Sêye. Birhik berya 11 salan di encama gulebarana li ser rêya Qamişlo de bi giranî birîndar bû. Otomobîla Birhik di nava tevgerê de bû dema di 13'ê Sibatê de teqe lê hatiye kirin û ew bi giranî tê de birîndar bû, pêşî rakirin nexweşxaneyên Qamişlo û piştre jî birin Helebê. Lê Birhik di 22ê Sibatê de jiyana xwe jidest da.

Partiya Demorkata Kurdistan-Sûriye (PDK-S), serkirdeyê xwe Nesredîn Birhik ku di Sibata 2012an de li ser rêya Qamişlo hatibû kuştin, bi bîr anî. PDK-Sê di 11mîn salvegera terorkirina wî de, bi çalakiyekê serkirdeyê xwe Nesredîn Birhik bi bîr anî. Merasima bîranînê li gundê Kevirê Dena li bajarokê Çil Axe yê Rojavayê Kurdistanê hat lidarxistin. PDK-S, Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) ku partiya desthilatdar li navçeyên Rêveberiya heyî, bi kuştina Nesredîn Birhik tohmetbar dike, lê PYD wê yekê red dike. Di merasîmên vejandinê de serkirdayetî û rêxistinên PDK-S û şandeke ji serokatiya Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) û şandeyên partiyên siyasî beşdar bûn. Herwiha encûmenên xwecihî yên ENKSê û rêxistinên jinan û ciwanan û Dezgeha Malbatên Şehîdan û kesayetiyên niştîmanî û cemawerên Kurd jî beşdar bûn. Nesredîn Birhik di sala 2012an li ser riya Qamişlo di êrîşeke çekdarî de hatibû kuştin. Birhik roja 13ê Sibata 2012an li ser riya Qamişlo rastî êrîşeke bi guleyan hatibû, bi giranî birîndar bibû û ji bo nexweşxaneyeke Helebê hatibû veguhestin, lê piştre ji ber giraniya birînan canê xwe ji dest dabû.

**Nesredîn Birhik kîye?**

Di sala 1960'an de li gundê Kevrê Dena yê girêdayî bajarokê Çilaxaya ji dayik bûye. Peymangeha elektirîkê qedandiye. Di temenekî pirr biçûk de tevlî Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya bûye. Pêşî bû endamê Partiya Sûriye ya Demokratîk, El-Partî û di sala 1998an de bû endamê Polîtburoya vê partiyê. Heta roja ku hat kuştin ji aliyê rejîma Sûriyê ve gelek caran rastî gefan hat û di sala 2004an de demekê di zindanê de ma. Di sala 2009an de dîsa hat girtin. Di sala 2011an de dest bi xebateke mezin kir. Ew ji aliyê hêzên herêmîyên PYDê ve gef lê dihate xwarin.

# ENKS ofîsên xwe li Efrînê vedike




Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) biryarê dide, baregehên xwecihî yên ENKSê li Efrîn û Cindirêsê veke û rola ENKSê li wê herêmê akîtv bike.

,ENKSê roja 17ê Sibata 2023an li bajarê Qamişlo civîna xwe ya asayî pêk anî û tê de li ser rewşa wêranker a erdheja ku li herêmên Kurdî li Bakur û Rojavayê Kurdistanê û bi taybet li Efrîn û Cindirêsê rû daye rawestiya ku di encamê de bi dehhezaran cane xwe ji dest dan û birîndar bûn û hejmareke mezin ji xanî, avahî, rê û pireyan hilweşiyan. Di civînê de karên ENKSê yên di vî warî de hatine kirin, hat pêşkêşkirin, ku wê name ji Netewên Yekgirtî û ji hikûmetên gelek welatan re şandine û bang li wan kiriye ku alîkariyên pêwîst û tîmên rizgarkirinê pêşkêş bikin û van deveran wek deverên wêranbûyî bi nav bikin, ta ku alîkariyên navdewletî jê re bên kirin. Her wiha ENKSê spasiya Herêma Kurdistanê, Serok Barzanî û Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî kir ku bi hawara ziyandîtiyên erdhejê çûne, bi taybetî li Efrîn û Cindirêsê.

ENKSê di civîna xwe de biryar da, baregehên xwecihî yên ENKSê li Efrîn û Cindirêsê bên kirin û rola wan li herêmê bê akîtvkirin, ji bo alîkariya ziyandîtiyan bikin, ziyanên çêbûne û binpêkirinên ku bandorê li wan deveran tên kirin belge bikin.

# Seîd Yûsif di hunera Kurdî de nayê dubarekirin

**Kurdistan**

Hunermendê Kurd Seîd Yûsif ku wek Mîrê Biziqê jî tê naskirin di sala 1947an de li bajarê Qamişlo yê Kurdistana Sûriyê ji dayik bû. Seîd Yûsif di 26ê Sibata 2020an de li bajarê Stenbolê yê Tirkiyê ji ber nexweşiya penceşêrê jiyana xwe jidest da, û li Qamişlo hate veşartin. Wî bi xwe piraniya gotinên stranên xwe daniye û awaz kiriye. Seîd evîndarê bajarê Qamişlo bû ku bi saya



strana wî Qamişlo wek bajarê evînê tê naskirin û binavkirin. Hunermendê Kurd Seîd Yûsif yekem hunermend bû ku Biziqê aniye Cizîra Rojavayê Kurdistanê û hemû temenê xwe da huner û muzîka Kurdî. Wî bi dehan kaset û bi sedan stranên nazik û xweş li pey xwe hîştin. Seîd Yûsiv li bajarê Qamişlo ji dayik bû û lê hate veşartin jî. Têkiliyeke balkêş di navbera Seîd û Qamişloyê de hebû. Bêhna Qamişlo ji jenîn û awazên wî difûriya. Seîd bû Qamişlo, Qamişlo jî bû Seîd û bi saya strana wî ya bi navê (Qamişlo bajarê evînê) êdî Qamişlo bi navê bajarê evînê tê naskirin. Seîd ku wek mîrê bizqê dihat naskirin, bi hunera xwe li hemû aliyên Kurdistanê û li cîhanê jî deng dabû. Lê dilê wî her li Qamişloyê lê dixist. Seîd Yûsiv ku 26ê sibata 2020an koça dawî kir, sala 1980 strana xwe ya navdar Qamişlo bajarê evînê tomar û belav kir. Niha gotinên vê stranê li ser gora wî hatine neqişandin. Seîd Yûsivê dilnazik di helbesta Qamişlo bajarê evînê de wiha dibêje:

Qamişlo Bajarê Evînê
Cihê govenda û civînê
Heger tu bi xwe evîndar î
Li wê ye dermanê birînê
Keçên wê tevde pir ciwan in
Xortên wê hemû dilovan in
Kalên wê pir mêr û giran in
Jinên wê wek zêrê li



xezînê

Derî divebê li ber mêhvana
Bi cî tînin soz û peymana
Lawên wê wek şêrê çiya ne
Her kes welat li bîrê tînê

Herwiha stran wî ya navdar Kê dinya hejand dengekî mezin veda ku di sala 1969an de hatibû nivîsandin
Kê dinya hejand
Kê dûlab gerand
Ew Barzanî kak
Rabû şûr kişand
Kurd hatin bi dor
Bê kotek û zor
Rijandin xwîna sor
Barzan lê şikand

Yek ji wa Barzan
Ew bazê pehlewan
Ew Mehdiyê zaman
Bi mêranî heyf hiland

Ne dêwê guhder´z
Ne ristem û gurz
Bê himet û hêz
Barzanî nav stand

De hêvî ma xweda
Himetê bid? Kurda
Wan mêr û merda
Xwîna xwe rijand

# Şêwekareke Efrînî bi vî şêweyî spasiya Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî dike

Şêwekara Kurd a Xelkê Efrînê Arîn Îbiş bi rêya nexşekirina wêneyê Nemir Mela Mistefa Barzanî spasiya Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî dike, ku wek take Dezgeh bûye ku alîkariyên mirovî gihandina Efrîn û Cindirêsê. Arîn tabloya xwe jî beramber Efrînê nîşan dide, vê yekê jî karvedanên mezin li pey xwe ve anîne.

